



# QELEM DI REWDINNE'ÎMA ŞÊX EBDURREHMANÊ AQTÊPÎ DE (Şeyh Abdurrahman Aktepî'nin Rewdınne'îm Adlı Eserinde Kalem)

M. Zahir ERTEKİN<sup>1</sup>

---

*Bidim destê xwo xameê serteras  
Bikim çerx û bazî çû dolabê aş*

*Qelem ey qelem ey qelem ey qelem!  
Bizane di dil de mi zehf in elem  
(Rewdınne'îm/Bend-28)*

## Kurte

Qelem motîfeke nazik a edebiyata klasîk e. Di metnên edebî yên klasîk de hêmanên wisa, helbet ji ber têdeya helbestvanî ya wê demê, şert û mercên civakî û katî ne. Bi vê rêbazê jî em bala xwe didinê ku helbestvan weke çûka ku hêlîna xwe çêkê, ji her hêmanên-pêdiviyên edebî sûdê werdigire û berhema xwe dibe serî. Di edebiyata Kurdî/Kurmançî de Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî (1854-1910) çiqas girîng û berhemdar be, berhema wî -*Rewdınne'îm*- jî şahkareke edebî ya Kurdî/Kurmançî ye. Çawa ku Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî li pey xwe şiverêyeke edebî vekiribe û di serî de ji malbata xwe gelek helbestvanên gewre gihandibe, wisa jî *Rewdınne'îma* wî; deriyekî nû yê mesnewîyan li Kurmançî û mîraçnameyên Kurdî vekiriyê. *Rewdınne'îm* jî hêla hejmarên malikên xwe ve jî yek ji mezintirîn

---

1 Yrd. Doç. Dr., Bingöl Üniversitesi Doğu Dilleri ve Edebiyatı Bölümü Öğretim Üyesi.  
zahירתekin@hotmail.com

mesnewiya Kurdî ye. Îcar ji ber ku berhemeke wisa mezin e, helbestvan gelek caran weke ku bêhna xwe berde, cih daye hêmana qelemê, pê re axiviye, de'wa gelek serkeftinan lê kiriye û pey re mijara xwe domandiye. Di vê gotarê de, em dê li ser bikaranîna qelemê di *Rewdinne'îmê* de bisekinin.

**Peyvên Sereke:** Mesnewî, Rewdinne'îm, Aqtepe, Şêx Ebdurrehman Aqtepî, Qelem.

### Abstract

The theme of pen has a gentle place in classical literature. The existence of such elements in classical literary manuscripts is related to the period the poet lived in, the conditions and the social structure of the time. Thus, it was observed that the poet, like a bird builds its nest, makes the use of all literary elements in creating his work. As the place of Sheikh Abdurrahman Aktepî (1854 – 1910) in Kurdish (Kurmanji) literature is irreplaceable, his work titled *Rewdinne'îm* is one of the magnificent works of this literature. As Sheikh Abdurrahman Aktepî pioneered in literature and caused several valuable poets to be raised in his family, his work titled *Rewdinne'îm* pioneered a new masnavi approach in Kurmanji literature. This oeuvre is considered to be the biggest masnavis of Kurdish literature even in number of verses. Since *Rewdinne'îm* was such a voluminous work, the poet used several “breather” themes in different points in the manuscript, one of which was the theme of **pen**. The objective of the study is to examine the theme of pen in the content of this literary work.

**Keywords:** Masnavi, Rewdinne'îm, Aqtepe, Sheikh Abdurrahman Aqtepî, Pen.

### Özet

Kalem motifi, klasik edebiyatta nazik bir yere sahiptir. Klasik edebi metinlerde böyle unsurların varlığı, şairin içinde yaşadığı dönem, şartlar ve toplumsal yapıyla da ilişkilidir. Bu yöntemle görülüyor ki, şair adeta yuvasını yapan bir kuş gibi, bütün edebi unsurlardan yararlanmakta ve bu şekilde eserini vücuda getirmektedir. Kürt/Kurmanci edebiyatında Şeyh Abdurrahman Aktepî (1854-1910) ne kadar önemli bir konuma sahip ise, onun *Rewdinne'îm* isimli eseri de Kürt edebiyatının şaheserlerindedir. Nasıl ki Şeyh Abdurrahman Aktepî edebi bir çığır açmış ve başta kendi aile efradından değerli şairlerin yetişmesine vesile olmuşsa, *Rewdinne'îm* adlı eseri de Kürt edebiyatında yeni bir mesnevi anlayışı getirmiştir. Bu eser beyit adedi itibarıyla da Kürt edebiyatının en büyük mesnevilerinden birisi olarak kabul edilmektedir. *Rewdinne'îm*'in bu denli hacimli bir eser olması hasebiyle, şair pek çok yerde tenefüs mahiyetinde farklı motifler

kullanmıştır ki bunlardan biri de *kalem* motifidir. Bu çalışmamızda bu eserin muhtevası içinde *kalem* motifini inceleyeceğiz.

**Anahtar Sözcükler:** Mesnevî, Rewdîne'îm, Aktepe, Şeyh Abdurrahman Aktepî, Kalem.

## Despêk

Ne tenê ji aliyê hêmanan ve belkî ji aliyê ruxsar, teşe û naverokê ve jî, bakurê Kurdistanê ji aliyê lêkolînên klasîk ên edebî ve ne di asteke berawirdiyê de ye. Em nikarin bi serahet di vî warî de statîstîkên têkûz jî bidin û her wiha em nikarin muqayeseyekê bi edebiyata Soranî re jî bikin. Loma; em jî di wê baweriyê de ne ku, di serî de heta ji destê lêkoleran tê, divê berhemana ji destxetiyê rizgar bikin. Senifandin, naverok û dewlemendiya edebiyata wan karekî paşekî ye. Tevî vî karê sereke, berhemên navdar ên çapbûyî û li ber destan jî, bi hêsanî dikarin bavêjin destarê lêkolînê. Ev berhema ku niha em dixwazin qelemê jê derînin jî berhemeke bi vî rengî ye. Di medreseyên Kurdistana Bakur de gelekî bi nav û deng e û helbestvanê berhemê jî xwedî taybetiyên ekolî ne û zaf berhemên giranbiha li pey xwe hiştine.

Qelem carinan di helbestê de mijara sereke ye, carinan jî alîkarê mijara sereke ye. Herwiha qelem carinan bi tenê helbestek e û ji malikên ku hejmara wan hindik e re mijar e. Carinan jî di nava berhemeke dirêj de hêmaneke girîng e û di gelek ciyên berhemê de kon vedaye. Di vê berhemê de jî em dibînin ku Aqtepî qelem weke alîkarekî ji xwe re bi kar anîye û mijara xwe bi serkeftî heta dawî ajotiye.

Armanca me ya vê gotarê bersivandina vê pirsê ye: “Hêmana qelemê, bi gelemperî di edebiyata Kurdî ya klasîk de û bi taybet jî di *Rewdîne'îmê* de ciyekî xwe yî çawa heye?” Belkî niha em di çarçoveya gotareke wiha bi sînor de nikarin *qelama* Kurdî daynin ber qelama Farisî, ‘Erebî û Tirkî. Lêbelê qe nebe di berhemeke Kurdî ya serkeftî de, em ê hewl bidin da ku taybetiyên qelemê û bikaranîna wê ci bi ci bikin.

## Qelem/Xame

*Qelem* bêjeyeke ‘Erebî ye. Di zimanê Yewnanî de bêjeya qelemê; di wateya *qamişê/rûlê ku di ciyên avî de şîn dibe, zil/qamiş û qamişê Hindî* de hatiye bikaranîn. Navê wê jî *kalamos* e. Ev bêje di latîni de, *kalamus* e; tê qebûlîkirin ku ji Yewnanî ev bêje ketiye nava ‘Erebî û navê wê qulibiye *qelemê*.<sup>2</sup> Şûna vê peyvê di Farisî de *xame* û *kilk*, di Tirkî de *kalem* û di Kurdî de *pênûs* û *qelem* tên bikaranîn. Di ferhengên Tirkî de qelem di wateyên; weke amûreke nivîsê,

2 M. Uğur Derman, “Kalem”, *DİA*, İstanbul 2001, XXIV, s. 245.

di saziyên fermî de ciyê karên nivîsevaniyê, amûra ku serî hatiye tûjkirin û wd. hatiye bikaranîn. Herwiha ji bo her cure nivîsê, nivîs û nivîskariyê jî qelem tête gotin. Di derbarê qelemê de jî hin bêje di ferhengên de hatine rêzkirin; weke qelemşor, qelemrew, qelemkêş, qelemkar, qelemkarî û wd.<sup>3</sup> Di tesefiwê de qelem termek e ku wateya wê, ‘ilmê hûrgilî ango zanista mufesselî ye.<sup>4</sup>

Di Qurana Pîroz de jî peyva *qelemê* derbas dibe. Qelem di sûretê ‘Eleq (96/1-4), el-Qelem (68/1-4), Luqman (31/27) û Alî ‘Imran (3/44) de derbas dibe.<sup>5</sup>

## Kurd û Qelem

Di muhtewiyata vê beşê de em dê qelemê di wateya “nivîskarî, pirtûknivîsîn” û bi amûra qelemê “berhemdarîya Kurdan a dîrokî” rave bikin. Ji ber vê sedemê dibe ku têkiliya vê binbeşê rasterast bi mijara vekolîna me ya sereke re nebe. Lê dîsa jî binavgînî ango neyekser bi mijarê re têkildar e. Ji ber ku yekser bi mijara esasî re ne têkildar e, em ê jî pir dirêj nekin.

Mijareke girîng ev e ku heta niha li ser Kurd û Qelemê gelek çarçûnên gengeşî çêbûne. Li ser vê yekê Kurd gelek çarçûnên hatine înkarkirin, nasnameya wan nehatiye pejirandin û têkiliya wan û qelemê ji hev hatiye qutkirin ango têkiliyeke wisa nehatiye qebûlkirin. Belê; divê di serî de em bidin zanîn ku Kurdan têra xwe jî qelemê sûd wergirtine, qelem bikaranîne û berhemên cihanpesendane anîne wicûdê. Lê divê em vê jî bêjin ku Kurdan piranî bi zimanê biyanî (‘Erebî-Farisî-Tirkî) nivîsandine. Her çî be jî têkiliya wan a bi qelem û hibr û nivîsê re ne kêmtî zanayên neteweyên din e. Bi sedan salan gelek berhemên Kurdan di medreseyan de hatine xwendin. Tefsîr, dîrok û hedîs di serî de, gelek mijarên dînî bi ‘Erebî ketine nava rûpelên berhemên zanyar û ‘alimên Kurd û wan qelem di nava tilî û movikên xwe de westandine. Ev jî ji bo ‘ilm û ‘irfan û zanyariya mêjûya kurd û Kurdistanê nexşerêyeke befreh li ber me datîne. Bi hezaran alimên Kurd, bi sedan cild, bi zimanê biyanî berhem nivîsîne û rind jî qelemê îstifade kirine. Gelekê wan, di beşên xwe de duayên ango mezintirîn pispor hatine qebûlkirin û bi sedsalan jî berhemên wan sûd hatiye wergirtin. Dixwazim çend mînakên li vê derê destnîşan bikim:

3 Ferit Develioğlu, *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi, Ankara 1986, s. 484.

4 Süleyman Uludağ, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Marifet Yayınları, İstanbul 1977, s. 298.

5 Aysun Sungurhan, “Nâbî ve Sâbit Divanlarında Kalem”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, IV/17, 2001, s. 148.

## Dîrok û Jînname

1. Ebu'l-Fîda, İmadeddîn İsmâil (w. 732/1331), *el-Muxtasar fî Axbarî'l-Beşer*, Daru'l-Ma'arîf (thk. Muhammed Z. Azb), Qahîre 1119.

-----, *et-Tibru'l-Mesbûq fî Tevârîxi'l-Mulûk* (thk. Muhammed Zeynehem Muhammed 'Azb), Mektebetu's-Seqafeti'd-Dîniyye, Qahîre 1995.

2. İbnu'l-Esîr, Ebu'l-Hesen İzzeddîn (w. 630/1233), *el-Kâmil fi't-Târîx* (thk. M. Yusuf ed-Dekake), Darul'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût 2003.

3. İbn Xelîkân, Ebu'l-Ebbas Şemseddîn, (w. 681/1282), *Wefeyâtu'l-e'yân* (thk. İhsan Ebbas), Dar Sadr, Beyrût 1968.

4. İbnu'l-Mustewfi el-Erbîlî (w. 637/1239), *Târîxu Erbil: Nebâhetu'l-Beledi'l-Hâmil bi-men Weredehu mîne'l-Emîsil* (thk. Samî b. es-Seyyîd Hammas es-Sakar), Daru'r-Reşîd lî'n-Neşr, Iraq 1980.

5. İbn Şahinşah, Muhammed b. Takiyyuddîn 'Umer (w. 617/1220), *Mizmâru'l-Heqâîq we Sirru'l-Helâîq* (thk. Hesen Hebeşî), 'Alemu'l-Kutub, Qahîre 1401.

6. Ebû Henîfe Dînewerî, *Exbâru't-Tiwâl* (Çev. Nusrettin Bolelli-İbrahim Tüfekçi), Hivda İletişim, Stenbol 2007.

6. İbnu's-Salah eş-Şehrezûrî, Ebû Amr Takiyyuddîn (w. 643/1245), *'Ulûmu'l-Hedîs* (thk. Nûreddîn 'Itr), Daru'l-Fikir, Dimeşq 1986.

## Qiraet

7. Şehrezûrî, Mubarek b. Hesen (w. 550/1156), *el-Misbahu'z-Zâhir fî'l-Qiraâtî'l-Eşrî'l-Bewâhir*, Laleli, nr. 67.

## Felsefeya İslamî

8. Şehrezûrî, Muhammed b. Mahmûd (w. 687/1288), *Nuzhetu'l-Erwâh ve Rawzatu'l-Efrâh: Tarîxu'l-Hukema*, (nşr. Abdulkerîm Ebû Şuweyrîb), Trablus 1988.

## Mekanîk

9. Cezerî, İsmâil b. Rezzaz (w. Ss. XII-XIII.), *el-Cami' Beyne'l-İlmî we'l-Amelî'n-Nâfi' fî Sinâ'atî'l-Hiyel* (thk. Ahmed Yûsuf el-Hesen), Heleb 1979.

## Çavkaniyên di Derbarê Zana û 'Alimên Kurd de

1. Rûhânî, Baba Merdûh, *Tarîx-i Meşahîr-î Kurd* (be-kûşîş: Muhammed Macîd Merdûh Rûhanî), Tehran 1383.

2. Tirîfe Ehmed Osman el-Berzencî, *Îshâmtu'l-'Ulemâî'l-Ekrâd fî Binâî'l-Hadaretî'l-İslamiyye*, Daru'l-Kutubu'l-İlmiyye, Beyrût 2010.

## Qelem di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de

Di edebiyata kurmancî ya klasîk de jî qelem amûreke girîng e ji keleşor û wêjeya Kurdî re. Gava ku em bi sedsalan bi sedan medreseyên Kurdistanê vekolin, dê bête dîtîn ku têkiliyeke xurt a zanyarên kurd û qelemê heye. Piranî bi dîwanan, helbestan, mesnewiyan, xezel û evînameyan qelemê rê li ber hest û dilinên 'aşiq û aliman vekiriye û heta îro hatiye. Lê divê bi taybetî di warê edebiyatê de em vê bêjin ku di numûneya Şêx Ehmedê Xanî û Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî de tê dîtîn, mişteriyên Kurdî her nebûne an kêmbûne. Ji ber vê yekê jî piraniyê zanayên Kurd berê xwe dane zimanên rewacdar û bêtir bi van zimanan nivîsîne.<sup>6</sup> Felsefeya "Ne ji bo sahib rewacan/Belkî ji bo biçûkên Kurmancan" (Xanî-Nûbehara Biçûkan) ji bo piraniyê nivîskarên Kurd nebuye armanceke sereke.

Qelem di dîwana Melayê Cizîrî de carekê weke *kilk*, carekê weke *xame* û heft caran jî weke *qelem* derbas dibe. Em dikarin ji bo edebiyata Kurmancî bêjeyên *qelemê* weke cara yekem, van bêjeyên ku Cizîrî di dîwana xwe de bi kar aniyê bipejirînin. Di dawiya malika helbesta "Îro ji Dest Husna Hebîb" a Feqiyê Teyran têgeha *qelemê* di wateya "tobeyê" ango "ji holê rakirina gunehan" hatiye bikaranîn<sup>7</sup>. Ji vê bêjeyê pê ve, di berhemên Feqî de *qelem* nayê dîtîn.

Qelem di edebiyata Kurdî/Kurmancî de di dawiya Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de bi tefsîlat ango wek beşeke serbixwe derdikeve pêşberî me. Di beşa *Paşgotin û Peyva bi Qelemê ra* de helbestvan serbestana bi qelemê re dikeve dan û standinê. Temo vê beşê wiha rave dike: "Ji hêla teoriya wêjeyê ve beşa "Paşgotin û Peyva Bi Qelemê Re" jî gelek seyr e. Li vir sê heb vebêj hene; *Pênûs*, *Ez-vebêj û Xanî*. Pênûs qala qedera xwe dike, Ez-vebêj pênûsê û Xanî dide ber hev, Xanî jî tiştên pênûsê jê re gotî jî Xwedê re dibêje, ew jî mîna pênûsê qala qedera xwe dike. Ez-vebêj hem şerê her duyan germ dike, hem jî mîna ku du pêlwan li benderê bin, şerê wan derdibirre. Pênûs jî Xanî re dibêje, "Wey xawiyê daweya kemalê". Ev gotineke gelekî seyr e. Ji ber ku Xanî bi beyta "*Xanî ji kemalê bêkemalî / Meydana kemalê dîtî xalî*" dest bi beşa "Sebebê Nivîsîna Pirtûkê Bi Zarê Kurmancî" dike. Nexwe ev metin li nava xwe jî vedigere. Tiştên wisa di teoriya wêjeyê de hê nû nû tene gotin. Gelek pispor di metnên modern de didine pey taybetmendiyên wisa. Lê em dibînin, ku tiştên wisa di wêjeya Kurdîya klasîk de hebûne"<sup>8</sup> Helbet di vê berhemê de berî vê beşê jî *qelem* di cînan de xuya dike lê tenê ev beş ranser bi qelemê re ketiye hevpeyvînê.

6 Di Mem û Zîn a Şêx Ehmedê Xanî û di Rewdinne'îm a Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî de, di gelek malikan de ev mijar hatiye nivîsîn. Ji ber ku mijara me ne ev e em dê zêde li ser vê yekê nesekinin.

7 Feqiyê Teyran, *Dîwan* (Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım), Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 2014, s. 252.

8 Selim Temo, *Hemû Berhem, Ehmedê Xanî*, (Latînze, M. Burhanê Şemrexî, edt: Kawa Nemir), Weş. Lîs, Amed 2008, Pêşgotin, r. 3.

Piştî Xanî em dibînin di yekem mewlûda Kurdî de jî *qelem* derbas dibe. Melayê Bateyî di vê mewlûdê de ne tenê di wateya amûra nivîsê de belkî ji bo nîşankirina qudreta Xwedê jî qelem hatiye bi kar anîn. Di beşa *Ibtîdaya Nûra Muhemmed* de qelem ciyekî dirêj û taybet digire. Li vê derê em dibînin ku qelem li rex erş, ferş û kursiyê hatiye danîn, ku ev hemû jî hebûnên sereke yên afirandî ne.<sup>9</sup> Dîsa di vê mewlûdê de qelem muxatabî Xwedê dibe. Ango Xweda bi qelemê diaxive, emir didiyê û qelem jî biedeb bersiva Xwedê dide. Ev guftûgoya Xwedê û qelemê jî yekem car e ku di edebiyata Kurdî de di vê mewlûdnameyê de tête dîtîn.<sup>10</sup>

Hevçaxê Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi, Şêx Fethullah Werqanîsî (1847-1900) jî di berhema xwe ya bi navê *el-Hemâil fi'ş-Şemâil* (Hunera Rewîştê)<sup>11</sup> de ciyekî taybet daye qelemê û vê tradîsyona xameyê daye domandin. Li gorî qene'eta me qelem di *el-Hemâil fi'ş-Şemâil* ê de mijareke serbixwe ya vekolînê ye.

Piştî Aqtepi û Werqanîsî jî gelek şairan di berhem helbestên xwe de kilk/xame bi kar anîne. Yek ji qelemiyên navdar jî Fethî el-Hezroyî (1892-1975)<sup>12</sup> ye ku bi navê *Qesîdetu'l-Qelem* qelemiyeyek nivîsiye. Ev qelemiye destxet e û nehatiye çapkirin. Li gorî nusxeya ku me ji Prof. Dr. Mehmet YALAR wergirtiye li ser rûpelê 'ewil ê qelemiyyeyê wiha hatiye nivîsîn: *Qesîdetu'l-Qelem li'l-ustâz el-Hac 'Ebdulfettah eş-Şehîr bi-Fethî el-Hezroyî*. Qeside ji 124 malikan pêk tê.

Helbestvanekî vê serdemê jî heye, şogerekî Aqtepi ye û bi qelemê re gelekî serê xwe êşandiyê ku ew jî Mela 'Eliyê Baqustanî ye. Baqustanî di biyografiya menzûm a *Siltan Şêxmûs*<sup>13</sup> de bi dehan malikan cî dide qelemê û bi awayekî pisporane wê neqşî helbesta xwe dike. Dema ku edebiyatnasek an wêjehezek vê berhemê bixwîne dê bi hêsanî bibîne ku têgeha qelemê weke amûreke xurt li ber wî/wê tezahur dibe. Bi gotineke din "qelem/pênûs" ê îlhamkariyeye mezin ji helbestvanî re kiriye û ev alîkarî, şoreş û serîhildana qelemê rê li ber helbestvanî vekiriyê. Qelêmê rê li ber helbestvanî vekiriyê da ku berehema xwe bi serkeftî

9 Mela Huseynê Bateyî, *Mewlûda Nebî* (amd. M. Xalid Sadînî), Kùltür Bakanlıđı Yayınları, Ankara 2015, r. 26-28; <https://zimannas.wordpress.com/2015/08/17/melaye-huseyne-bate-mewluda-pexemberi/> 20.08.2015.

10 Bo nimûne;  
Hêj ne erş û ferş û kursî û qelem/Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

...  
Hate emrê Padîşahê La-yezâl/Maliku'l-mulkê Celîlê Zû'l-celâl  
"Ya qelem binvîs bi emrê Padîşah."/"Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah"  
*Qale*: "Uktub Lâ ilahe illa Ene,/Hem Muhemmed qasidê emrê min e."  
Sacîd û bê-hîş kerî sed salî dî/Ser hilîna got: "Îlahî seyyîdî  
Ez dizanim *Lâ ilah illa* Tu yî, /Ew Muhemmed hemberê îsmek bûyî  
Kêşk e ya Sultan û bâ-cud û kerem?"/Padîşahê sermedê got: "- Ya qelem.

11 Şêx Fethullahê Werqanîsî, *el-Hemâil fi'ş-Şemâil* (Hunera Rewîştê), Wergera Ji Tîpên Erebi, Zeynelabîdîn Zinar, Weş. Doz, Stenbol 2007.

12 Mela 'Ebdulfettah Hezroyî, *Dîwana Fethî* (Berhevkirin: Tehsîn Îbrahim Doskî), Weş. Nûbîhar, Stenbol 2012, r. 23.

13 Ev berhem jî çap nebûye.

kuta bike û ji bo xwendevanan jî çêjêke edebî ya sirûştî diyarî bike. Ji ber vê jî têgeha *qelemê* mijareke berfireh a vê berhemê ye. Nîgaşa Qelemê di *Siltan Şêxmûs* de weke manîfestoyekê derdikeve pêşberî me. Helbestvan bi axaftineke qelemî dest bi nivîsa xwe dike. Him mijarê balkêştir dike û him jî bi qelemê re bazar û muhebbetê dike. Hevde beşên pirtûkê hene. Di heşt beşan de qelem zindî ye û nivîskar bi qelemê re şor dike. Têgeha “qelem”ê reng û rûyê berhemê guherîye û ala edebiyata berhemê bilind kiriye. Baqustanî rengê qelemê bi awayekî hostane li temamê berhemê xistiye. Ew yekaheng û monotona mijarê bi saya qelemê şikandiye. Ji vî aliyê jî helbestvan di binê bandora Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî de maye.

Qelemiyyeke destxet jî li ber destê me heye ku di van salên dawî de hatiye nivîsîn. Him ne hatiye weşandin him jî weke serdem nûjen be jî, bi şikl û nave-roka xwe ve klasîk e. Helbestvanê vê qelemiyyeyê Mehmet Yalar e. Navê helbestê “Ey Xame” ye.

Ji bilî van helbestvanên sereke, helbet divê di vî warî de xebatên berfireh bêtin kirin da ku qelemiyyeyên Kurdî/Kurmancî bi zelalî derkevin holê. Ji ber ku mijara me tenê bi berhemekê sînorkirî ye em ê li ser vê kevneşopiyê zêde ranewestin.

## Rewdinne'îm

Rewdinne'îm mîraçnameyêke Kurdî/Kurmancî ye. Mijara wê ya sereke mîrac û semaîla Hezretî Pêxember e. Berhem bi terza mesnewiyê hatiye nivîsîn û ji 4513 ristanpêkhatiye. Piştî *el-Hemaîl* ku 5.529 beyte mesnewiya kurmancî ya herî dirêje.<sup>14</sup> Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî di pirtûka xwe de 35 beş bi cih kiriye. Babeta her beşekê jî ya beriya xwe û ya pişt xwe cuda ye. Şêx Ebdurrehman Aqtepî van beşên pirtûkê wekî “Bend” bi nav kiriye. Wek; “Bendê Ewwel, Bendê Sanî”. Di nav beşa 29. de beşek bi serê xwe, bi navê ‘Bendê ecnebî der mersiye ê şehzadegan Hesên û Huseyn’ li ser pakrewanbûna neviyên Hezretî Pêxember –Hesên û Huseyn-nivîsandiye. Ev beş dikare weke helbesteke xweser an weke mersiyeke şahkar a Kurmancî jî bête pejirandin. Lewra di mersiye ya Kurmancî de ev mersiye jî aliyê honandina mijarê û ji layê hewandina term û bêjeyan ve edebiyateke dewlemend heye. Babeta vê pirtûkê bi taybet mî'rac e. Beriya ku dest bi qala Mî'racê bike di beşa 21. de behsa Rewşa (Şemaîl) Peyxember ‘eleyhîselam dike. Heta niha li ser wêjeya vê berhemê lêkolînek nehatiye kirin. Ji bilî danasîna wê, li ser naveroka wê jî xebateke balkêş nîne. Berhem di sala 1884an de hatiye nivîsîn. Ev pirtûka hêja, li Kurdistanê du caran (bi elîfbêtika erebî) çap bûye. Cara pêşîn, di sala 1966'an de ji layê mele Ehmedê Qoxî çap bûye. Cara duyem jî, di 12.03.1986an de, bi destê mele Zeynelabidînê kurê mele Remezane Amedî/Diyarbakir çap

14 [https://ku.wikipedia.org/wiki/Fethullah\\_Werqanis](https://ku.wikipedia.org/wiki/Fethullah_Werqanis) (gîhîn: 12.10.2015).



bûye. Herwiha wî li serê şerhek jî nivîsiye û malikên wê bi zimanê Erebi şirove kirine. Çapa Qoxî 240 rûpel in û ya Amedî jî 534 rûpel in. Di sala 1988 an de, Zeynelabidin Zinar piştî wergirtina destûrê, bi alîkariya M. Emîn Narozi, *Rewdinne'îmê* jî tîpên Erebi veguhaztiye tîpên Latîni û di 1991ê de jî li Swêde daye çapkirin. Ev çap 438 rûpel e.<sup>15</sup> Di sala 2011'dan de Tehsîn Îbrahîm Doskî li Dihokê ev berhem weşandiye.<sup>16</sup>

## Qelem di Rewdinne'îmê de

*Xame* di Rewdinne'îmê de 43 caran, *qelem* jî 47 caran derbas dibe. Lê ev tenê wekî bêje ye. Hêjmar malikên axaftina bi qelemê re, mijûliya bi wê, şîret û suhbetên digel wê, mijarên bi wê peywendîdar û w.d. gelekî zêde ne. Di vê beşê de em ê li ser bikaranîna qelemê di Rewdinne'îmê de rawestin.

*Xame* yekem car di benda çarem de derbas dibe. Ev beş beşa selat û selamên li ser cenabê Pêxember (s.xl.) e. Helbestvan bê hed û bê hesab selat û selaman direşîne. Ji bo vê yekê geh ji teyr û tuyûran, geh ji av û ajalên, geh bi qasî lefz û gotinên însanan û wd. li ser resûlê Xwedâ selat û selaman dixwîne. Bi vî awayî bi qasî hemû tiştên ku di *Lewhê Kebîr* de, ku *Şahê Qedîr* bi xameyê ew nivîsiye, selat û selaman li ser Resûlullah dixwîne/tîne.<sup>17</sup> Dîsa di heman beşê û di heman mijarê de helbestvan dibêje ku; hed û hesab, qeyd û bend ji selat û selamên li ser Resûl tune, herwiha ne xame dikare van selewatan birêje ser kaxezê û ne jî kitêb dikare hêjmara van selewatan di hundirê xwe de bihewîne.<sup>18</sup>

Qelem di beşa pêncan de, di sebebê telîfa berhemê de hatiye bikaranîn. Helbestvan piştî ku danasîn, mensubiyet û mezheba xwe diyar dike, xwe wekî guhehkarekî pênase dike û destpêka rahiştina xameyê destnîşan dike.<sup>19</sup> Herwiha qelem di vê dere de *cunbiş* e, bi *işqek giran* tê, di emrê helbestvan de *rewan* e. Di hundirê helbestvan de germahî ye, coş e û ew/xame wasîteye ku vê coşê derxe der. Qelem ji dil heraretê dikêşe û *ji sûzê cîger xwûna reş* dirijîne.<sup>20</sup>

Di benda şeşan de xame reben û bê zeban e, helbestvan dibêje ez ê destê xwe daynim ser serê qelemê û bikim nalîn, da ku hemû eşkereyan bikim 'eyan.<sup>21</sup>

Di beşa heftan de helbestvan hêdî hêdî xwe bera nava mijara xwe dide û ji

15 Evdirehmanê Axtepî, *Rewdneim*, Latîniye: Zeynelabidin Zinar, Weş. Pencinar, Sverige/Stoc - holm 1991, r. 2-3; <http://ku.wikipedia.org/wiki>. (gîhîn 20.11.2014.)

16 Tehsîn Îbrahîm Doskî, "Şêx Hesênê Nûranî û Hindek Navdarên Binemala Wî", *Vehînoka Rewdu'n Neim* (berhevkirin: T. Îbrahîm Doskî), Weş. Spîrêz, Dihok 2011.

17 Digel cumle şey ê di *Lewhê Kebîr*/Ku pê xame gêraye *Şahê Qedîr* (Bend-4)

18 Ne 'ed jê re peyda bitin ne hîsab/Ne medbûtê xame ne hesra kitab (Bend-4)

19 Kemberbendê seccadeê Neqşiyân/Ji xîzmet guzarane wan ewliyan  
Evî mûcrîmê bê nawa can gûdaz/Bi vî terzî wî xame kir nexme saz  
Li min iqtîrah kir biraê 'ezîz/Hebîbê cîger nazîdarê temiz (Bend-5)

20 Me destê xwo da ser serê xame ê/Ku pê neqşî kim sûretê name ê  
Qelem hate cunbiş bi 'işqa giran/Bi ferqê serê xwo di emr im rewan  
Heraret ji qelbê me kêşa qelem/Ji sûzê cîger xwûnê reş hate dem  
Mûneqqed mûneqqa kalamê selis/Nezim kir di silkê çu durrê nefîs (Bend-5)

21 Bidim destê ser Xameê bê zeban/Ku nalende kim aşîkara 'eyan (Bend-6)

qelemê re dibêje were em berê xwe bidin qissetê, ango em dest bi çîroka xwe/mijara xwe bikin.<sup>22</sup> Dîsa di vir de qelem ji bo însa û lêkirina kevirên helbestê amûr û alîkarê helbestvan e.<sup>23</sup> Helbestvan heta vê beşê nezma xwe dixwe xizmeta mijara xwe. Lê, dixwaze li vê derê meqseda xwe kuta bike.<sup>24</sup> Ango berhema xwe bi dawî bike. Weke sedem jî, dirêjkirina helbest û nivîsê, weke acizkirina nazir û xwîneran dibîne.<sup>25</sup> Lê qelem dikeve dewrê û ji helbestvan re dibêje; helbesta te rind e, pak e, delal e.<sup>26</sup> Kesek dê ji vê nutqê aciz nebe.<sup>27</sup> Barê xîretê bikêşe ser milên xwe û teqez berdewam bike.<sup>28</sup> Hinek wesfên Xeyrîl Enam vebêje,<sup>29</sup> da ku tu xwe bigihîni meqseda xwe.<sup>30</sup> Piştî van şîretên qelemê helbestvan li xwe mikur tê<sup>31</sup> û rastgoyiya qelemê dipesinîne. Lê dibêje ku dil ji hicrê *kem û kastî* bûye.<sup>32</sup> Bi vê guftûgoya bi qelemê re mijar didome.<sup>33</sup> Li dawîya vê beşê Aqtepî ji dirêjkirina mijarê aciz dibe û ji qelemê re “bes” dibêje û dixwaze ku kelimê biqedîne.<sup>34</sup>

Di dawîya beşa nehan de dema qelem sistiyê dide xwe<sup>35</sup> Aqtepî jî mijarê diqedîne û berê xwe dide duaya xwe ya ku di dawîya hemû beşan de cih girtiye.<sup>36</sup>

Di dawîya beşa yanzdehem de Aqtepî ji qelemê dixwaze ku beşê kuta bike. Lewra dibêje ku êdî nikarim gotinê zêde bikim<sup>37</sup> û piştî du malikên din jî dibêje min qelem danî û bi kezebeke kul lava ji Xwedê kir.<sup>38</sup> Xuya ye ku qelem dost e û palpişt û umîdeke di nivîsê de. Lewra mijar her çî be qelemê ji bîr nake. Ev xwestek û lavaya ji qelemê di dawîya beşa duwazdan de jî mîna diyardeyeke eşkere derdikeve der.<sup>39</sup>

22 Were ey qelem biçne ser qissetê/Beyan kim bi şêrînî xasiyyetê

Çu ewel qelem bit rewan serseri/Wesif kim ewê cebhetê enwerî (Bend-7)

23 Were ey qelem sewqî ma nehnû fih/Ku însa bikin beyt û şî'ran bedih (Bend-7)

24 Me qesd kir ku bendê li vir kim xîtam/Dirêj ez nekim şî'r û beyt û kelim

25 Ne teb'e ji bû 'aşiq û şa'iran/Ku 'icz û melalê bidin naziran (Bend-7)

26 Welêkin qelem gote bû min bihal/'Ecêb nutqekî pak ê şêrîn delal (Bend-7)

27 Çi sewda ye tu pê ketî ey fulan/Dibêjî melalet bibîtin ji van

Çisan dê melalê bikin ehlê teb'/Ji vê nutqê şêrîn ê ba wezn û sec' (Bend-7)

28 Te şêrîn beyan kir bi nezmê qebûl/Kîtabet bi min şiklê xelq ê Resûl

Bikeş barê xîret bibe kellebaz/Were cîlweger be bi fexr û bi naz (Bend-7)

29 Beyan ke hinik wesfê Xeyrîl Enam/Ku da pê bibit meqseda me temam

30 Ji hey atê Sûltanê 'Alem hinik/Beyan ke bi asarê mehkem hinik (Bend-7)

31 Me dî gotina xame ê rastî bû/Welê dil ji hicrê kem û kastî bû (Bend-7)

32 Me anî qelem kir serê Xameê/Ku cumbuş bidim vê siyeh cameê (Bend-7)

33 Me anî qelem kir serê Xameê/Ku cumbuş bidim vê siyeh cameê (Bend-7)

34 Bese ey qelem bes dirêj ke kelim/Te çend beytê anî sewad û nîzam (Bend-7)

Welêkin çî hedde ku ewsafê Şah/Tu 'ed kî bi vê fikrê pîs ê tebah

Xîtam ke kelimê li vir hani han/Cesaret li meydan meke el eman (Bend-7)

35 Qelem sistî bû qet'î kir ev kelim/Mî jî bangî kir Xaliqê Layenam (Bend-9)

36 Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar/Ker û lal û gêj e tu nîne medar (Bend-9)

37 Were ey qelem bes dirêj ke sûxen/Nikarim nezim kim kelimê 'elen (Bend-11)

38 Mi danî ji destê xwo xame'w kîtab/Me bakir Xwuda der cîger îltîhab (Bend-11)

39 Bese ey qelem ev kelimê giran/Dibit kerb û hesret li nik haziran (Bend-12)

Di feqda ewê Xatemê xamê bûn/'Ecaîb mûsîbet li Îslamê bûn (Bend-12)

Bese bes dirêj ke kelimê bi kul/Yedê xwo dirêj ke bibêje ji dil (Bend-12)

Qelem di beşa sêzdehem de rûreş e, efxan e, ah e û derdkêş e<sup>40</sup>. Duwatê<sup>41</sup> qelemê sernîgûn e, murekkeb jî xwîn e ku kul û keseran dirêje ser rûyê kaxezê.<sup>42</sup> Dêrdê ku di dil de meyyiaye, ahên ku bandoreke mezin li qelb dike, bi rîya musweddeyê rû-beyan dibe.<sup>43</sup>

Di beşa hijdehem<sup>44</sup> û bîst û yekem de, qelem di wateya xwe ya mecazî de hatiye bikaranîn. Di vir de qelem ji bo jîholêrakirina gunehan amûreke paqijiyê ye.<sup>45</sup>

Beşa bîst û duwem şahkarê berhemê ye ji bo qelemê. Di vir de meriv dikare di du beşan de qelemê rave bike. Ango Aqtepî berî ku derbasî mijara xwe bibe, di serî de bi şiddet bi qelemê re dikeve têkiliyeke rexneyane û rexneyeke tund li qelemê dike. Paşê lê tê rehmê û li ber digere. Pey re derbasî mijarê dibe. Ango di vê beşê de qelem geh berxikeke û nava guran de ye, geh jî berxikeke li ber dilan e.

Di vê beşê de, helbestvan dixwaze ku qelem di xizmeta wî de be.<sup>46</sup> Bixwaze çi binivîse ew alîkariyê pê bike.<sup>47</sup> Lewra bi qelemê dide zanîn ku mijareke girîng daye ber xwe. Ev mijar jî mîraca Resûlê Xweda ye, ku ev jî tiştêkî gelek gewre ye.<sup>48</sup> Aqtepî dixwaze ku helbesta xwe bixemilîne û alaya wê bilind bike.<sup>49</sup> Ji bo vê yekê jî divê hem xame û hem jî nûser renc û zehmetê bikêşin. Cûr bi cûr dayîna şewq û coşiyê jî, dixwaze bide qelemê.<sup>50</sup> Li hember vê dayînê jî daxwaza wî ji qelemê kemerbestbûn û mûtî'îya wê ye. Cangiraniyê jî qet qebûl nake.<sup>51</sup> Eger ku qelem bi vî rengî alîkariyê neke, bi serjêkirinê tete tehdît kirin. Ligel van rexne û gefên tund û tûj, jê re dibêje “bi edeb be û nameyê neqîş ke”. Ango tiştta ku ez dixwazim binivîsim, tu îta'et bike û binivîse.<sup>52</sup> Ji qelemê re dibêje weke ceresê/zengilê binale di nava tiliyên min de,<sup>53</sup> li hember min raweste,<sup>54</sup> bi min re be, em dê bi hev re bikin ah û zar. Li meydana şer, ez û tu em dê şer bikin, li hevûdû

40 Di destê mi de xame ê rûsiyah/Dibit pare agir ji efxan û ah (Bend-13)

41 Diwît: Pelema darî ya ku bi hubrê kare nivîsê pê tete kirin.

42 Duwat ê me jî dê bibit sernîgûn/Mûrekkeb dibî tede yek qitre xwûn (Bend-13)

43 Ji tesîrê ahê dilê derdê dar/Di destê me mûswedde bit ş'ûledar (Bend-13)

44 Bikêşe qelem ser gûnahê di min/Bide xatirê Mûstefa ê mezin (Bend-18)

45 Bikêşe qelem ser gûnahê di min/Setîr ke li min van xeta ê mezin (Bend-21)

46 We be'dû were ey qelem guh bidêr/Di emrê me qaîm bibe şubhê şêr (Bend-22)

47 Xwo pêk bîne qenc mûntezîr be li min/Neqil ke çi elfazê şêrin ji min (Bend-22)

48 Me tiştêk mezin daye ber xwo yeqîn/Me qesd e ku Mî'racê Şahe Emîn (Bend-22)

49 Nezîm kim wezin kim bi asarê qenc/Bikêşim di weznê çi te'b û çi renc (Bend-22)

50 Eziyyet bikêşim bidim te te'eb/Cihan pur bikim keyf û ferh û tereb

Ku coş bim ji asarê 'işqê gelek/Bidim bû te enwa'ê şewqê gelek (Bend-22)

51 Kemberbeste be qaîmê emrî be/Bi teb'û bi hîddet wekî nemrî be

Nekû cangiran bi di vê deftere/Ji dest im dixûyî derbetê xencerê (Bend-22)

52 Fewellahî wellahî wellah qesem/Çi weqta ku serkorî bî ey qelem

Bibirrim serê te bi kêrê wûsan/Biçi dengê zarîne te meclîsan

Dû şeq kim serê te heta sîne ê/Teeddub bike neqîş ke Name ê (Bend-22)

53 Ela ey sûwarê enamîl feres/Binale ji destê me şubhê ceres (Bend-22)

54 Digel min mûqabil be ey şehsûwar/Ez û tû bikin ah û efxan hezar (Bend-22)

xin.<sup>55</sup> Em dê cengeke wisan bikin ku wê cin û ins û melek şaş û metel bimînin.<sup>56</sup> Li meydana cengê dê şûran li serê te dim û dê 'eslê te û xwêdana te bi erdê ve biçê.<sup>57</sup> Dê hemû ins û can temaşa kin û aferînan bidin min.<sup>58</sup> Peyderpey dê derban li te bixim, bi vî awayî ez ê meydana helbest û xezelê zevt bikim, bixim binê hîmayeya xwe.<sup>59</sup> Ji nezmê/helbestê ez dê hemû 'alemê têxim nava zemzemeyê. Ango ez ê bi helbesta xwe gurmînê ji cihanê bînim.<sup>60</sup> Dema ku helbesta min li meydana rabû ser piyan û cilwe dane xwe, çi şa'irên ku hene dê hemûyan binpê bikim.<sup>61</sup> Ez ê weke 'ewrê demsala biharê bikim gujeguj û tev bi hev re dê alîkariyê bidin destên min.<sup>62</sup> Ez dê sema û zemînê bi xulxuleyê tijî bikim/dagirim, hemî wechê 'alemê dê bibin meş'ele.<sup>63</sup> Wê şewq û roniyêke wisa ji min biçê ku dê ferq di navbera roj û şevê de nemîne.<sup>64</sup> Ey qelem! Her çiqas ku 'işq zorê bide min, ez jî dê ew çend zor û zehmetê li te bikim. Ango ez ê nivîsê li nivîsê; helbestê li helbestê zêde û rewneqtir bikim.<sup>65</sup>

Piştî van gotinên tûj Aqtepi bi bergerînekê deng li qelemê dike. Jê re dibêje ez bi qurbana canê te bim, tu cangiraniyê û tembeliyê nekî di vê xebata min de.<sup>66</sup> Me di nava hevalan de şermezar dernexî, lewra tu muhterem î.<sup>67</sup> Were ey qelem tîzîrew be û bi vî şiklî ez îftîxar bikim li ehlê zeman.<sup>68</sup> Ey xame ez hezar carî bi qurbana te me.<sup>69</sup> Ger tu xîret nekî ez dê di nava şermê de bimînim. Rê li ber me ye. 'Ecele bi 'ecele xwe bişidîne û di emrê min de be.<sup>70</sup> Di derbarê 'işqa yarê de heçî tiştên ku hatin qelbê min, berî ku ez bejim/vebêjim tu neqîş ke û binivîse.<sup>71</sup> Tevî gurz û tîr û kevana xwe, li Rexşê siwar be û li meydana xwe çerxan bide.<sup>72</sup> Weke dolabên aş li xwe fetlan bide xwe.<sup>73</sup> Amade be ji bo derbên –di dahatû depur bi elem û ey qelem nebêje ku ev bêbextî ye.<sup>74</sup>

55 Li meydan li hev din hinek sedmetan/Ji destê me bigrî tû çend derbetan (Bend-22)

56 Bikin cengekî pehlewane gelek/Teheyyûr bimînin hem îns û melek

Tehemtsifet bême meydana ceng/Li meydan çu sindan bimînim dereng (Bend-22)

57 Bikin berqê seyfan li ser ferqê te/ Di 'erdê biçit eslê te 'erqê te

58 Temaşa bikin cemle ê îns û can/Bikin aferîn şehsûwarê zeman (Bend-22)

59 Peyapey li te derbetan rebtî kim/Ku meydana şî'r û xezel debtî kim (Bend-22)

60 Ji nezmê bixim 'alemê zemzeme/Nebêjît li ber min çi kes ez heme (Bend-22)

61 Li nêv hendi meydan ku bêm cilwe kim/ Heçî şa'ir in cumle yextirme kim (Bend-22)

62 Bigurjim wekî 'ewrê feslê buhar/Bi ser destî ê min hemî din qerar (Bend-22)

63 Zemîn û sema pur bikim xulxûle/Hemî wechê 'alem bibit meş'ele (Bend-22)

64 Şev û rojê dunya wekî hev bibit/Ji hingî ji min berq û purtew biçit (Bend-22)

65 Ji 'işqê çîqa ez heraret bikim/Li te zêde zor û eziyyet bikim (Bend-22)

66 Bi qûrbanê canê te bim ey qelem/Neki cangiranî tû ey muhterem (Bend-22)

67 Me şermî nekî nêv hevalê di min/Nebin lafê mehd ev kemalê di min (Bend-22)

68 Were ey qelem tîzîrew be çunan/Bikim îftîxar ez li ehlê zeman (Bend-22)

69 Hezar car bi qûrbanê te xame bim/Tu xîret bikî belkî şermî nebim (Bend-22)

70 Xwo bişidîne ey xame zûd û bi lez/Di emrê mi de ser serê xwo bibeze (Bend-22)

71 Heçî hate qelbê me ez 'işqê yar/Me hêja negotî neqîş ke bi xar (Bend-22)

72 Hilîn gurz û tîr û kewanê di xwo/Li Rexşê sîwar be li meydana xwo/ (Bend-22)

73 Bike çerx û bazî li meydana faş/Ger û fetlî ke şubhê dolabê aş (Bend-22)

74 Mûheyya be bû derbetê pur elem/Nebêje ku bê bextî ye ey qelem (Bend-22)

Di beşa bîst û pêncem de Aqtepeî hişyariyê û de'wa îta'etê li qelemê dike.<sup>75</sup> Dibêje ez dixwazim 'urûca Resûl nezim bikim, lêbelê kezeba min ji hicr û firqeta wî perçe parî ye.<sup>76</sup> Loma ey qelem, ji ber hicra hebîb îro kezeb li min bûye kebab. Loma ey qelem eger te sistî û cangiranî li min dît, li min negire, lewra ez birîndar im.<sup>77</sup>

Di beşa bîst û heştam de, berî ku derbasî mijara xwe bibe, qelem dîsa hevrê ye, hemderd e û godarekî bê deng û sewt e.<sup>78</sup>

Di serê beşa bîst û nehem de, di behsa firqet û hicra hebîb de dest bi mijarê dike. Dibêje eger ji wesletê/lehiqîn re umîdek hebûya, me dê emrekî bi şiddet li qelemê bikira û me dê gelek beyt û helbestên nuwaze li hev rêz bikirana. Wisa nuwaze ku dê 'Ereb û 'Ecem şaş û metel bimana.<sup>79</sup>

Di beşa (ku ne beşeke sereke ye) "Bendê Ecnebî Der Mersiyeyê Şehzadegan Hesên û Huseyn" de, ji ber êşa mijarê, helbestvan bi şiddet li qelemê jî têtê xezebê.<sup>80</sup>

Di beşa (ku ne beşeke sereke ye), "Baz Geşten Bi Qisseê Pêşîn" de, ji qelemê re dibêje xwe pêk bîne, da ku di nava şa'iran de bibim wekî şah. Lê mixabin ji hicrana yarê şîrîn, ez gelek hezîn im.<sup>81</sup>

Di malika pêşîn a beşa siyem de dibêje ku min bi navê Xweda ev qelem qetî' kir û bi sipasiya Wî min reqem li ser kaxezê xistin.<sup>82</sup>

Di beşa sî û sêyem de qelem di wateya xwe ya derûnî-ledunnî de hatiye bikaranîn. Di afirandina hebûnan de Xweda hemû tişt seranser ji bo resûlê xwe afirandiye. Qelem jî yek ji wan aferîdeyên ku di destpêka afirandina gerdûnê de hatine afirandin.<sup>83</sup>

75 Were ey qelem qencî hişyarî be/Li emr û li nehyê me gûhdarî be  
Ku îlqa bikim ser te emrê şedîd/Di emrê me qaîm be şubhê 'ebîd (Bend-25)

76 Me qesd e ku halê 'urûca Resûl/Beyan kim bi ebyat û şî'rê qebûl  
Welêkin ji hicrê cîger pare par/Ji pêtê fîraqê cîger pir ji nar (Bend-25)

77 Bizan ey qelem ketme halek xerab/Ji hicra Hebîbî cîger bû kebab (Bend-25)  
Eger cuzî sistî bibînî ji min/Me hêvî rîca ye ku negrî li min (Bend-25)

78 Bidim destê xwo Xameê serteraş/Bikim çerx û bazî çu dolabê aş (Bend-25)  
Qelem ey qelem ey qelem ey qelem/Bizane di dil de mi zehf in elem (Bend-28)

79 Eger min hebûya ji weslet umîd/Me bikra li ser xame emrek şedîd  
Gelek beyt û şî'rê nefîsê nefîs/Me bînane weznê bi nutqê selîs  
Teheyûr bimana 'Ereb ba 'Ecem/Dilê şa'iran têk bigirta elem/  
Welêkin ji hicranê yara şepal/Nema min ne fikrek ne nûtqek delal (Bend-28)

80 Ku xemgîn bibim ez bivê cur'e ê/Qetî' kim bi hiddet serê Xameê  
Wekî ney binalim ji qelbê hezîn/Bikêşim hezar def'e ah û enîn  
qelem germî bitin di nezmê gelek/Binalin li ser çerxê 'alî melek

Nezim kim hinik metemê metemî/Ku giryende kim îns û cinnan hemî (Benda Ecnebî)

81 Xwo pêk bîne ey Xameê rûsiyah/Di nav şa'iran de bibim şubhê şah  
Welêkin ji hicranê yarê şîrîn/Hezîn im hezhin im hezîn im hezîn

82 Bi Bîsmîllah min qetî' kir ev qelem/Bi Hemdîllah min zed li kaxez reqem  
(Benda Baz Geşten...)

Were saqiya bîne camê xemîr/Li ser min giran e giran e emîr (Bend-30)

83 Netînan wûcûdê me 'erş û sema/Dîgel kursî û Sîdretîl Mûnteha (Bend-33)

Di beşa sî û pêncem (beşa dawî) de qelem gelekî xurt û gur û gir hatiye bikaranîn. Ji qelemê re dibêje dixwazim xatir bixwazim û vê musweddeyê ji destê xwe deynim.<sup>84</sup> Tu jî meclisa helbestvanan kuta bikî û meqamên cûr bi cûr û herwiha ji bo qelbê min istirahetekê bide û agirê kerbên min jî bikuje.<sup>85</sup> Aqtepî paşê berê xwe dide xwediyê meyxaneyê û jê re wiha dibêje, dilê min zare zar e, ah û enînên min hene li ser vê xebatê. Min û qelemê di vê rêwîtiyê de gelek zewq û keyf û henek dîtine. Di vê dawiyê de divê em ji hev xatir bixwazin. Ey Muxennî! Tu dilê min fereh bike.<sup>86</sup> Di heman beşê de Aqtepî bi mexlesa xwe ya “Şemseddîn” hunera helbesta xwe û serkeftina xwe ya di helbestê de tîne ziman. Dibêje di nava Kurd û ‘Ereb û Rûman de helbestvanekî mîna min nîne.<sup>87</sup> Dibêje dema ku ez gurzê qelemê bixim destê xwe û beyreqa helbestê li ‘alemê bilind kim, zimanekî mîna şûrê Zulfîqar bikêşim, wê demê dê hemû xwedanfezîlet û sahibhuner jîrî û hunera Şemseddîn qebûl bikin, ango dê mejbûr bimînin ku serkeftina min bipejirînin.<sup>88</sup>

Dîsa di vê beşê de qelema xwe dişibîne ejder/ejdeha ku ji bo gencîneya wateyan gewher e. Ji devê vê ejdehayê, beytên/malikên nûranî weke pêtên êgir diçûrisin.<sup>89</sup> Di pey re devê qelema xwe dişibîne mar. Marekî wisa ku ji dost û yaran re tiryak/şîfa ye û ji dijmin re jî semm û jehr e.<sup>90</sup> Dibêje dema ku ez ji xameya xwe hibra ku weke miskê ye birêjim, wê demê enbera terr û teze jî pîs û hişk dibe. Ji vê neqşeyên qelema min a nazenîn li Çînê Manî û Erjeng jî ketine şermê.<sup>91</sup> Hezar kaniyên ava heyatê ya temiz, di vê tariya qelema min de veşartîye. Dema ku ez qelemê bixim destê xwe, di cîhana hunera helbestê de yekî wekî min tune. Ango ez yekta me.<sup>92</sup>

Hemî îns û cin û melek serteser/Ji bû te me xelqandin ey mû'teber (Bend-33)

Eger tû nebûya me lewh û qelem/Netînan wûcûdê ji kenza 'edem (Bend-33)

Ji erd û semaan ji 'erşê 'ezîm/Ji lewh û qelem kursiyê mûsteqîm (Bend-33)

84 Wîda' kim ji bû mehber û Xameê/Ji destê xwo deynim vê mûsweddeê (Bend-35)

85 Xetim ke tû jî meclisa şa'iran/Bi rast û hîcâz û seba îsfehan  
Bide îstîrahe ji bû qelbê min/Vekuj be' dekî ateşê kerbê min (Bend-35)

86 Mûxennî dilê min dîkit zarîê/Bi ah im li ser vê emekdarîê  
Min û Xameê pir emek dîtine/Gelek zewq û keyf û henek dîtine  
Di vê axîrî em dîkin el wîda'/Ji bû Xameê pir bi nûr û şu 'a'  
Mûxennî mûferreh ke qelbim bi rûd/Evê meclîsê me bike pir sûrûd (Bend-35)

87 Ez im Ebdûrrehman e sahib hûner/Şehînsahê mûlkê sûxen serteser  
Xwudan fedl û sîhr û kelam û edeb/Şehê şa'irê Kurd û Rûm û 'Ereb  
'Elemdarê iqlîmê şî'r im temam/Mûfewwed ji bû min re nezm û kelam (Bend-35)

88 Ku bigrim di destê xwo rumhê qelem/Ji nezmê li 'alem bilind kim 'elem  
Bikêşim zebanek wekî Zûlfîqar/Li meydan vewestim bi tebl û nîqar  
Heçî ehlê fedl û belaxet yeqîn/Qebûl kin hemî beyreqa Şemsiddîn (Bend-35)

89 Evê Xameya min wekî ejder e/Ji bû gencê me'nî ni ku pur gewher e  
Ji femmê ewê ejderê nûrî beyt/Muşe'şe' dibitîn wekî pêt û zeyt (Bend-35)

90 Mîdadada devê Xameya şûbhê mar/Ji yaran re tûryaq e zehrê neyar (Bend-35)

91 Ji xame birêjim mîdadê çu mişk/Yeqîn 'enberê ter dibit pîs û xuşk  
Ji neqşê evê Xameya nazenîn/Xecil bûne Erjeng û Manî li Çîn (Bend-35)

92 Hezar çesme abê heyatê neqî/Di vê zulmetê xame ê min xeffî  
Ezîm yekketazê di vê 'irse ê/Di destê xwe bigrim dema Xameê (Bend-35)

Eger ez qelemê têxim destê xwe û li nivîsê vegerim, dê qelem ji şeraba cennete çiziran/reşheyan birêje ku, ji bandora wê dê herkes mest û sermes bibe. Hemû hunermendê vê qadê jî dê têkevin erjengî û bindestiyê. Welhasil divê her kesek qebûl bike ku şehriyar û hostayê xezel û helbsetê ez im.<sup>93</sup> Qelem ji bo min mertal e û zimanê min jî şûrê Zulfîqar e.<sup>94</sup> Qelem herwiha di vê beşê de di wateya ku gunehan dinivîse de jî hatiye bikaranîn. Ji ber gunehên ku qelemê nivîsandine, nivîskar tobe dike.<sup>95</sup>

Di dawiyê de ji qelemê re dibêje bes e, bibire û bes qelaşyan bineqîşîne. Te ew qas tişt vegotin ma kanê bazar? Kanê mişteriyên ku tiştên te rêz kirine ku bixwîne? Bê guman te gelek wateyên rind anîne ziman, lê xerîdarî nîne ji bo cewheran.<sup>96</sup>

### Qelem û 16 Malikên Dawî yên Rewdîne'îmê

Qetî' ke eya xame ê ba wefa  
Tû *Rewdîne'îm* ê bi zewq û sefa

Me di weqtê nabit fûrûxt û rewac  
Evê malê zerbeft û libs ê dîbac

Me anî qetî' kir kalamê 'eceb  
Ji tarîxê Hicrî di salê xeşeb

Di roja mûbarek di nav hefte ê  
Di 'Îda hemî mumînan Cûm'e ê

Di selxê Rebî'îl Ewel mahê sal  
Ji mahê 'Ereb ew hîsabê delal

Di vê sal û mahê mûbarek nejad  
Mûbarek be ya Reb li cûmle 'îbad

93 Ku bigrim di destê xwo ez Xameê/Bi heybet bigêrim li ser nameê qelem reşherêz bit bi xemra cînan/Hemî ehlê 'esrim ji îns û ji can Ji tesîrê sehbayê min mestî bin/Hemî walîh û dehş û bindestî bin Xûlase di îro ez im şehriyar/Di îqlîmê şî'r û xezel tacîdar (Bend-35)

94 Ez im Heyder ê Sefder ê namîdar/qelem rumh û ezmanê min Zûlfîqar (Bend-35)

95 Mî tewbe ji zembê ku nûsî qelem/Li ser min feqîrê di dil de elem Mî tewbe ji zembê bikim îqtîraf/Binûsit li ser min qelem bê xîlaf (Bend-35)

96 Were ey qelem bes ke neqqaşyan/Bese qet'î ke hinde qellaşyan Verêtin te hinde kalam û xeber/Kî ye ku qebûl kit ji te ev qeder Ji enwa'ê me'nî te anî mezad/Welê sûkê malê te bûye kesad Xerîdarî nîn in ji bû cewheran/Ketin ber piya cewherê defteran (Bend-35)

Rehet bûye payê evê xame ê  
Ji qet'a bewadiyyê vê nameê

Ji şurba mîdadê ku bîtabî bû  
Ji mehber devê xame sîrabî bû

Wîda' kir ji mûswedde û defterê  
Me qapaxê danî li ser mehberê

Temaşa heçî kin li şî'rê feqîr  
Ji ed'iyee xwo mekin min jibîr

Bibêjin Îlahî tu vî şa'irî  
Nesûzî di nav dûzex û agirî

Ji bû nazîm û katîb û nazîran  
Ji bû qarî yû samî' û hadîran

Ji bû da û babê di me cumleşan  
Ji bû 'alîmanê bi 'îz û nîşan

Ji bû cumleê salîh û salîhe  
Ji bû Rûhiyê jarî el fatîhe

Bi "Bismîllah" bû îbtîdaê kelim  
Bi "Hemdîllah" dîsan bikim îxtîtam

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar  
Kerr û lal û gêj e tu nîne medar

### Encam

Qelem tevî kaxez û hibrê çandike qedîm diyariyê me dike. Ev her sê hêmanên girîng ji bo jiyana neteweyan a çandî teybetiyên xwe yên xweser hene. Helbestvanên klasîk, ji ber pesinandina qelemê di Qurana pîroz û di hedîsên cenabê Pexember de, ev hêman kişandine berhemên xwe û herwiha berhemên xwe jî bi vê bîr û baweriyê nivîsandine. Loma hem nivîsîn û hem jî di nivîsê de hêmana qelemê bi xwe, gelek çar û bûye amûreke berhemên nivîskî. Aqtepî jî yek ji wan şair'en Kurmanc e ku di Rewdine'îma xwe de ev motîf di newhêd malikan de derbiriye û riyeke mezin li ber qelema xwe vekirîye. Qelem di destê



Aqtepî de, hunerên edebî li hev rêz kirine, mecaz ketine nava malikan û gotin qewîtir bûye.

Di vê gotarê de me hewl da ku di Rewdine'îmê de motîfa *qelemê* vekolin. Me xwest ku em van pirsan bibersivîn: “Ji serê berhemê heta dawiya qelemê ciyekî çawa wergirtiye, roleke çawa listiye, bandoreke çawa li helbestvan kiriye û têkiliyeke wê û helbestvan çawa rû daye?” Di temamê malikên ku bi qelemê hatiye honandin de, me bersiva van pirsan derxist û rewşa qelemê ya di berhemê de raxiste ber çavan.

Di berhemê de du wateyên qelemê derketin pêş. Yek, amûreke ku karê nivîsê pê tete kirin, li ser kaxezê, lewheyê û wd. dinivîse. A din jî qelema Xwedê ye ku ji ezel ve Xwedê pê re şor kiriye, li ser lewha mehfüzê nivîsiye, mexlûq e, emr e, nûr e, ku ev jî wateyeke manewî dide qelemê.<sup>97</sup> Helbestvan piranî qelem di wateya ‘ewil de bi kar anî be jî, wateya duduyan jî -wateya qelemê ya derûnî/ ledunnî- ciyekî taybet werdigire. Lê di wateya xwe ya rastîn/yekemîn de bi gelek tiştan/amûran hate şibandin. Weke mînak; mar, ejdeha, dostê bi wefa, heval, jehr, tiryak, misk, enber, neqqaş, qellaşî û wd.

Manîfestoya herî hêja di beşa bîst û duyem de xuya dibe. Li vê derê qelem geh di nav şer de ye, geh li ber dilê şair berxikeke nazîdar e. Dema ku helbestvan ji bo helbesta xwe sêla sor vêdixe, ango hestên wî helbesta wî bi coş diajon, qelem jî di wan malikan de xurtî û qelenderiya xwe werdigire. Bêje di bine serê qelemê de rengu rengu neqaşkariyê dikin. Hubra ku jî qelemê diniquite, bêjeyên têr-edeb li ser kaxizan direşîne. Bi xuşîna dilînên şair, qelem jî dixuşe. Bi giriyên şair qelem jî digirî û di ihtîmala tembeliya şair de tehdît û gef li qelemê tete kirinê.

Axaftinên Aqtepî bi qelemê re, para pirtir a vê mijarê ye. Aqtepî bêtir li ser xizmeta qelemê, erk û wezîfeya wê û xebata wê ya qedirbilind disekine. Herwiha di gelek malikan de hate dîtin ku qelem geh li ber dilê wî hevlekî şirîn e û geh jî ji hest û pêjnên coşawer, pê re di nava şer de ye. Helbet ev şer di navbera hestên wî û nivîs û kaxez û qelemê re derbas dibe. Dema ku hestên wî rê nadin wî, ew jî dixwaze ku qelem zû bi zû hestên wî têxe bin qeyd û bendan. Ji ber ku ev jî gelek caran ne pêkan e, wê demê şer û pevçûn bi qelemê re rû dide. Ev jî hem şewq û hem zewqeke mezin dide helbes û berhemê.

Weke dawî îro klavye û teknolojiyê derbên mezin li qelemê xistine. Klavyeyên kompîturê ketine şûna qelemê. Helbet ev yek, ji bo pêşveçûneke ‘esrî pêwîst e û gelek behreyên wê jî hene. Lê, divê qelem sedî sed neyete avêtin û weke *name* yan *sêwî nemîne*. Lewra dîrokeke wê ya pîroz heye û Kurdî di serî de hemû zimanên cihanê deyndarê qelemê bi xwe ne. Qe nebe divê nifşên pêşerojê bê

97 Ji bo zêdetir agahî bnr. İbrahim Aslan, “Levh-i Mahfûz’un Delaletî Sorunu”, *Ankara Ün. İlahiyat Fak. Dergisi*, 50:1, Ankara 2009, r. 25-47.

qelem û ji qelemê bêhay nemînin. Têkiliya nivîs û qelemê jî divê berdeyam be. Ne tenê berhemên edebî û 'ilmî, belkî zanistên weke mînyatur, xetnûsî (hunera xweşnivîsê) û hunera tezhîbê jî divê bête teşwîq kirin da ku hunerên qelemî ji holê neyên rakirin û bîranîna wan a mêjûyî bête meşandin.

## Çavkanî

- , "Şêx Hesênê Nûranî û Hindek Navdarên Binemala Wî", Vehînoka Rewdu'n Neîm, (berhevkirin: T. Îbrahim Doskî) Weş. Spîrêz, Dihok 2011.
- ADAK, Abdurrahman, "Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdîti-Elewîti-Neqşebendîtîyê", *Kovara Nûbiharê*, 134, Stenbol 2015, r. 10-15.
- ASLAN, İbrahim, "Levh-i Mahfûz'un Delaletî Sorunu", *Ankara Üniv. İlahiyat Fak. Dergisi*, 50 (1), Ankara 2009.
- DEVELLİOĞLU, Ferit, *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, Aydın Kitabevi. Ankara 1986.
- DIRBAS, Mistefa Silêman, *Serhildan û Warera Cûrên Nû Yên Edebî di Kurmanciya Jojî Da (1850-1925)*, Weş, Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan Rêveberiya Çap û Belavkirinê, Dihok 2012.
- DOĞAN, Muhammet Nur, "Fuzûlî'nin Kasîde-i Kalemîye'sinin Şerhi", *Prof. Dr. Abdülkadir Karahan'ın Anısına, Uluslararası Divan Edebiyatı Sempozyumu*, Beykoz Belediyesi Kültür Yay, İstanbul 2008.
- DOSKÎ, Tehsîn İbrahîm, "Şêxên Neqşîbendî û Bedirxan Beg" *Kovara Nûbihar*, 117, 2012.
- FEQIYÊ TEYRAN, *Dîwan*, Werger û Şîkar: Kadri Yıldırım, Wezaretê Çandê, Ankara 2014.
- MELA 'EBDULFETTAH HEZROYÎ, *Dîwana Fethî*, Berhevkirin: Tehsîn İbrahim Doskî, Weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- MELA HUSEYNÊ BATEYÎ, *Mewlûda Nebî*, amd. M. Xalid Sadînî, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 2015.
- ÖZAYDIN, Murat, *Şeyh Abdurrahman Aktepe: Hayatı, Eserleri ve Görüşleri*, (Yayımlanmamış Doktora Tezi), Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara 2008.
- PERTEV, Ramazan, *Mîrsadu'l-Etfal, (Şahrahê Kûdekan)*, Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî, Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin 2012.
- SUNGURHAN, Aysun, "Nâbî ve Sâbit Divanlarında Kalem", *Uluslar arası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, C.4, S.17, Ankara 2001.
- ŞÊX EVDİREHMANÊ AXTEPÎ, *Rewdne'îm*, amd: Zeynelabidîn Zinar, Stockholm 1991.

ŞÊX FETHULLAHÊ WERQANISÎ, *el-Hemâil fi's-Şemâil (Hunera Rewiştê)*,

Wergera Ji Tîpên Erebi, Zeynelabidin Zinar, Weş. Doz, Stenbol 2007.

TEMO, Selim, pêşgotina *Hemû Berhem, Ehmedê Xanî*, Latîniye, M. Burhanê Şemrexî, edt: Kawa Nemir, Weş. Lîs, Amed 2008.

UZUN, Mustafa, "Divan Edebiyatı", *Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi*, Dergâh Yay, İstanbul 1977.

YAVUZ, Yusuf Şevki, "Kalem", *DİA*, İstanbul 2001, XXIV, 243-245.

ZİNAR, Zeynelabidin, "Medreseya Aktepeyê", *Kovara Nûpelda*, Van 2012.

## Pêvêk



**Pêvêk 1:** Rûpelê 'ewil ê Rewdinne'îmê.



Pêvek 2: Rûpelê dawî yê Rewdinne'îmê.